

# FERHENG

SOMERÎ-KURDÎ & KURDÎ-SOMERÎ

Mamê ELÎ  
Suleyman YILDIRIM



# **FERHENG**

**SOMERÎ-KURDÎ & KURDÎ-SOMERÎ**

**J&J**-FERHENGNAME: 1/1

SOMERÎ-KURDÎ  
**FERHENG**  
KURDÎ-SOMERÎ

AMADEKIRIN  
Mamê ELÎ & Suleyman YILDIRIM

GERÎNENDEYÊ WEŞANÊ  
Azad ZAL

EDİTOR  
Azad ZAL

REDAKSIYON  
**J&J**

BERG Û RÛPELSAZÎ  
**J&J**

ÇAPA YEKEMÎN  
Pûşper 2011

ÇAPXANE  
Berdan Matbaacılık  
Navnîşan: Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi, C/Blok, No: 239  
Topkapı / İSTANBUL  
Tif: 0212 613 12 11

ISBN: 978-605-62251-0-9

[SERTİFİKA No: 22054]

© Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasinê bêyî destûra weşanxaneyê û nivîskêr bi tu awayî  
nayê kopîkirin û nayê belavkirin.

**AJANS J&J**

Navnîşan: Huzurevleri Mh. 188. Sk. 1/C Blo. No: 21  
KAYAPINAR/DIYARBAKIR



Tif: +90 412 257 57 70  
Mobile: +90 530 691 46 73  
Malper: www.ajansjj.com  
E-name: ajansjj@gmail.com  
weshanenjj@gmail.com

---

**Mamê ELÎ**  
**&**  
**Suleyman YILDIRIM**

# **FERHENG**

**SOMERÎ-KURDÎ & KURDÎ-SOMERÎ**



Mamê Eli; Di sala 1977an de li Nisêbînê ji dayîk bûye. Dibistana seretayî û dibistana amadehiyê li Nisêbînê xwendiyê. Piştî ku Zanîngeha Dicleyê bêşa Jimêryariyê xilas kir, li Zanîngeha Ataturkê Zanistiyên Perwerdehiyê xwend. Piştî kutakirina zanîngehê li Nisêbînê dest bi mamostetiyê kir. Ew niha li Nisêbînê mamostetiyê dike û xebatên nivîsarî û lêkolînên dîrokî û zimanî dimeşîne.

Berhemên Wî:

\* Mewlûd (Tîpguhêziya Mewlûda Batê), Weşanên Berçem, 2005-Stenbol

\* Mirina Jaro (Wêne-dastan), Weşanên Berçem, 2007-Stenbol

Suleyman YILDIRIM; Di sala 1977an de li Nisêbînê ji dayîk bûye. Dibistana seretayî û ya amadehiyê li Nisêbînê xwendiyê. Li zanîngeha Stenbolê di bêşa "Zimanên Serdêmên Kevnar û Çandên Wan" de xwendiyê. Ew bi qasî 6 mehan li Almaniyayê li zanîngeha Julius-Maksimiliansê perwerdehiya "Zimanên Altorîantalîstîk" ango "Zimanên Rojhilata Nêzik" ên wekî Somerî, Akadî, Urartûyî, Hîtitî, Elamî, Hattiyî û Luwîkî dît. Yildirim xebatên xwe yên li ser çand û zimanên serdema kevnar dimeşîne.

## NAVEROK

- \* Pêşek / 7
- \* Pêşgotina Edîtor / 9
- \* Spasî / 14
- \* Pêşkêşî / 15
- \* Destpêk / 17
- \* Ferhenga Somerî-Kurdî / 37
- \* Ferhenga Kurdî-Somerî / 95
- \* Çend têgehên pişewerî û bazirganiyê / 171
- \* Çend deqên Somerî û wergera wan / 172
- \* Jêder û perawêj / 176



## PÊŞEK

**S**erdema ku em tê de dijîn wekî “Serdema Zanist û Teknolojî”yê tê binavkirin. Di qada teknîkî û zanistê de gelek pêşketin çêbûne û zanîn û zanyarî gihîştîye ber destê her kesên ku bixwazin bi dest bixin. Bi rêya internetê tora ragihandina zanînan ketiye hemû malan. Di derveyê îstîsnayan de cî û warên ku tora ragihandinê negihîştibê nemaye. Ev jî zanîne erzan dike û zanîn bi qasî serê pêçiyên destê mirov nêzî mirov bûye. Lê rastiyeke jî heye; hemû tiştên ku di ser rêya tora ragihandinê re tên tev ne zelal in, tev ne rast in û tev ne pak û pêkan in. Ji ber ku zanînen tora ragihandinê ji hêla her kesî/ê ve dikare bê guhertin, bê zêdekirin û bê kêmkirin. Hemû kes dikarin bi riya tora ragihandinê “rastiya xwe” pêşkêşî her kesî/ê bikin.

Helbet rastiya her kesî/ê heye. ‘Ango rastî guherbar e.’ Lê rastiya giştî jî heye ku ev jî ji aliyê zanyariyê ve tê diyarkirin û civak jî dipejirîne.

Bi awayeke giştî mirov dikare bibêje ku ‘rastî’ di nava ‘rastiyeke xwe’yî de her diçe wenda dibe û ev jî gengeşiyekê derîne holê. Ji ber wê jî hê jî ‘rastiyeke derbasdar’ heye ku ew jî “rastiya nivîsê ya ku li ser kaxid hatiye nivîsîn” e.



Nivîsa ser kaxid nivîsa sefandî û parzûnkirî ye. Ew ê nivîsê bi dirustî û bi rastî dikare rastiyan ji mirov re vebêje.

Me jî li ser vê rastiye berê xwe da “rastiye parzûnkirî” û me got “zanînen herî baş û pak û biqîmet zanînen ser kaxid in.” Û me berê xwe da zanyariyê. Me got; “zanînen ku di nava rûpelên qirêjî yê dîrokê de veşarî mane, em wan jî nava tariya reşasî derînin û pêşkêşî xwendevanan bikin.”

Wekî Weşanên J&J; me heyîn û hebûna xwe li ser vê yekê diyar kir û me got; ‘Em ê ji jêderên rastiye parzûnkirî bi rê bikevin û dakevin jêwerên qada jibîrvekirinê.’

Û me got; ‘ziman’ û me got ‘ferheng’...

Rastiye zimanzaniyê, rastiye ferhengzaniyê, rastiye parzûnkirî ne û giş hatine tesdîqkirin. Têkilî û pewendiya navbera zimanan herî baş bi rîya ferhengan tê dayîn.

Li ser vê rastiye me jî wekî Weşanên J&J xwest ku em têkilî û pewendiya navbera zimanê Somerî û zimanê Kurdî bi rêya Ferhenga Somerî-Kurdî û Kurdî-Somerî pêşkêşî lêkolîner, zanist û zimanzanên Kurd û Kurdî bikin.

Ji aliyê lêkolîner û zimannasên hêja yê wekî Mamê ELÎ û Suleyman YILDIRIM ve vê Ferhenga Somerî-Kurdî hat amadekirin. Em jî wekî Weşanên J&J bi egera ku lêkolîner û zanist û kesên pêwendîdar jê sûd wergirin diweşînin.

Di vê ferhenga li ber destê we de bi qasî 1500 peyvên Somerî hene. Wateya wan a bi Kurdî hatiye danîn. Di derveyê wê de peyvên pişeyî û çend deqên Somerî jî li dawiya pirtûkê cî digirin.

Em destpêka Weşanên J&Jyê bi vê ferhenga giranbuha û pîroz dikin û em dibêjin; “Em ê xebatên xwe yê bi vî rengî bidomînin...” (23.05.2011)

## PÊŞGOTINA EDÎTOR

**G**elê Kurd di bîr û bawerîya xwe de, di jîyan û tevgera xwe de pêş ketiye; bi vê pêşketina xwe re tixûbên hişmendî û qada ramangeriyê jî berfireh û tundtir kiriye. Vê rewşa civaka gelê Kurd rasterast li ser Zimanê Kurdî jî bandorê dike. Êdî ziman bi tenê zimanê jîyanê û zimanê axaftinên rojane nîn e. Zimanê Kurdî bi pêşketinên civakî re qadê li xwe fireh dike û pê re berê xwe dide nûjeniyê. Dema ku berê xwe bide nûjeniyê divê li raboriya xwe jî vegere.

Raboriya Zimanê Kurdî li ku ye, di kîjan derê de ye?

Ev pirsîyar êdî serê pispors, zimanzan, lêkolîner û leksiyo-grafan diêşîne. Ji bo bersiva vê pirsê bê dayîn divê ku mirov li raboriya nişteciyên herêma Kurdistanê binêre. Li Kurdistanê û li çepera wê kîjan gel û netew jiyane û bi xwe re çi anîne, çi hiştine û bi xwe re çi birine?

Ev nişteciyên Kurdistanî gelek tiştên nexuya û veşarî li dû xwe hiştine.

Yek ji van nişteciyên Kurdistanî Somerî ne. Li gorî dîroknas û lêkolîneran Somerî li ser rûyê dinyayê nemane. Wekî gel di nava rûpelên dîrokê de hatine nixaftin û wenda bûne. Bi wan re zimanê wan jî wenda bûye. Zimanê wan 'zimanê mirî' ye.

Zimanê Someran Somerî ye. Zêdeyê kêlik<sup>[\*]</sup> û pênfayînen dîrokî yên ku ji aliyê arkeolog û dîroknasan ve hatine dîtin û hatine xwendin (hinek ji wan jî hê nehatine xwendin) pêmayî û mîrata li dû wan tiştek nemaye.

Somerî kî ne? Mîratwer û peyrewên wan kî ne?

Ev pirsîyar jî bi nîqaş û bi gengeşe ye. Ji lew re li gorî berjewendiyên demî û serdemî gelek dewlet xwedîtiyê li Someran kirine û li gorî wê "lêkolîn û lêgerînan" peyrewiya xwe ya Sumeran pêş ve birine. Lê hê jî ev gengeşî û nîqaş didomin.

Somer navê welatekî li Mezopotamyayê ye û ji gelê ku li wî welatî dijî re Somerî tê gotin. Di heman demê de ji bo zimanê wan jî Somerî tê gotin. Li gorî zanista dîrokê Somer, kevintirîn şaristanî ye. Li Somerê bingeha civaka îroyîn; li nava Someriyana bingeha pergala çînayetiye, bingeha pergala ayîniye, bingeha pergala felsefiye û zanistê hatiye danîn.

Wê demê divê di derbarê Somerî û welatê wan de hin rastiyan giştî bêne zanîn. Somer ji ku hatine nayê zanîn. Lê bi qasî ku ji belge û kêlikên dîrokî yên ku hatine xwendin ji 6mîn hezarsala Berî Zayîne de li aliyê başûrê Mezopotamyayê, di navbera xeleka dawîn a navbera rûbarên Dicle û Feratê de nişteci bûne û bingeha şaristaniye li wê derê danîne. Her wisa welatê Someriyana li başûrê Kurdistanê li seriya kendava Besrayê dikeve.

Di vê serdemê de, li ser vê erdnîgariye Somerana bajarava kirine. Bajarên wekî Erîdu, Ûr, Kurda, Nippûr, Ûrûk, Kîş, Lagaş, Larsa û yd. ji aliyê Someriyana ve hatine avakirin. Bajarên ku Someriyana avakiribûn şaredewlet bûn. Perestgehên bi navê Zîgûrratê hatibûn çekirin û li dora wê perestgehê bajarava dikirin.

Di salên 2700ê Berî Zayîne de Agadeyî tene li Somerê bi cî dibin û bi Someriyana re hevpariya dewletê dikin. Lê têkçûna Somerana bi êrişên Gotiyana pêk tê.

Pêwendî û tekiliya navbera Somerî û Kurdî çi qas heye?

Pêmayînen Somerî yên ku Zimanê Somerî diyar bikin kêlikên ku bi nivîsa mîxî hatine nivîsin in. Ev kêlik hatine xwendin û di derbarê Somerî de gelek zanînen berbiçav derxistine holê. Ev jî ji aliyê ziman ve hin nîşaneyana dideber me. Li gorî van nîşaneyana têkiliya Somerî û zimanên Kurdistanî, yên Mezopotamyayî, yên Rojhilata Navîn derdikeve holê. Her çi qas wekî ku 'Kurd peyrewên Someriyana in' bê gotin jî ev wekî rastiyeke giştî hê nehatiye desdîqkirin.

Di dîrokê de gelê ku pêşî nivîsê bi kar aniye Somerî ne. Wan bi navê "nivîsa mîxî"<sup>[Vî navî ji aliyê dîrokanan ve hatiye danîn.]</sup> şeweyeke nivîsê bi kar anîne. Bi rêya kêlik û belgeyên dîrokî ev nivîsa

mîxî hatiye dîtin û hatiye deşîfrekirin. Di ser wê re zanînen li ser zimanê Somerî jî digihîjin ber destê me. Ku mirov behsa zimanê Somerîyan bike; divê ku haya mirov ji nîqaş û gengeşiyên li ser Somerîyan jî hebe. Tirk bi piştrastkirina “Weqfa Dîrokê ya Tirkan” “lêkolîn”ên ku pêşkêş kirine; gotine ‘Somer ji Asyaya Navîn hatine û dibe ku koka wan jî Tirkan be.’ Xwediyê vê angaşê ew kes in ku digotin “Kurd, Tirkên çiyayî ne...” Li gorî wan 165 peyvên Somerî û yên Tirkî yek in.

Ereb û hin “dîrokzan”ên ku bi sponsoriya pereyê Ereban ê petrolê kar û lêkolînan dikin dibêjin; “Somerî jî milletên Samî ne û zimanê wan jî yek ji zimanên Samî ye.”

Ji bo ku mirov bibêje; “Somerî Aryanî ne û têkiliya wan bi gelên Aryanî yên îroyîn re heye, divê ku hin nîşane û delîl di destê mirov de hebin.

Ji bo ku mirov bibêje Kurd peyrewên Somerîyan in; divê ku mirov du tiştan bigire dest. Yek jê hevpariya erdnîgariyê ye, ya din jî ziman e. Peyvên hevpar rastiyeke didin destê mirov. Lê ev jî bi temamî rastiyeke nade ber destê mirov. Ji ber ku Somerî îro nemane, wekî gelê wendayî û zimanê Somerî jî wekî zimanekî mirî ye tu caran dê ev ew ê neyê tesdîqkirin.

Di ser van zanînan re rastiyeke giştî heye ku Somer xwedî mîrateke xurt in û ev mîrat jî bo hemû dinyayê ye, hemû civak jî vê mîratê sîd wergirtine. Diviya bû ku berî her kesê, berî her civakî civaka Kurdan jî mîrata Somerîyan sîd wergirtana. Ji lew re Somerî û Kurd hevparê heman erdnîgariyê ne, ango Kurdistanî ne...

\* Ji bo bikaranîna ferhengê çend têbinî:

1- Di beşa Somerî-Kurdî de li gorî alfabeya Kurdî ya îroyîn hin tîp tune ne. Li gorî gil û kêlikên ku hatine deşîfrekirin û gencîneya peyvên Somerî, yên ku bi [A, B, D, E, Ê, F, H, I, Î, K, L, M, N, P, R, S, Ş, T, U, Z]yê dest pê dikin hene. Ferheng jî li gorî vê hatiye amadekirin. Peyvên ku bi [C, Ç, F, J, O, Q, Û, V, W]yê dest pê bikin nehatine peyda kirin.

2- Ji bo ku xwendevanên Kurd bi rehetî bikaribin jê sîd

wergirin li gorî bilêvkirin û dengdana Kurdî peyv hatine nivîsîn. Her çi qas bilêvkirineke standard ya navnetewî hebe jî me ji bo xwendevanên Kurd bilêvikirina taybet ya Kurdî tercîh kir.

3- Di peyvên Somerî de hin xal [.] hatine danîn. Ev xal ji bo ku yekeyên peyvên somerî bêne dîtîn hatine danîn. Ji aliyê wateyê ve tu pozîsyona wan tine ye. Di bilêvkirinê de jî heman tişt derbasdar e. Wekî mînak: Ê.DUB.BA.A dema ku bê bilêvkirin wekî ÊDUBBAA tê gotin.

4- Di peyvên Somerî de determînatîf jî bi awayekî taybet hatine nîşandan. Ev bi tîpên hûrdek hatine danîn. Wekî mînak: MUNUS<sup>U</sup>LI.SIKIL

5- Ji bo xwendevanên Kurd bi hêsanî bikaribin jê sûd wergerin me aliyê Kurdî-Somerî jî amade kir. Di beşa Kurdî-Somerî de peyv û nav û têgihên taybet ên bi zimanê Somerî û yê din bin ew jî wekî xal hatine nivîsîn. Peyvên ku ne bi Kurdî bin bi kîjan zimanî bin di nava kevanê de bi kurtasî hatine nivîsîn. Wekî mînak:

Mîna [so.] MÎNA (Yekaneya Pîvana graniyê ku nêzî 500 gramî ye.)

Di fehengê de kurtenavên ku hatine bikaranîn: [so.] Somerî ye.

6- Piştî ferhengê di dawiya pertûkê de hin deqên bi Somerî û wergera wan a Kurdî hatiye nivîsîn, da ku hin têgihînin li ser Somerî bikevin ber bala xwendevanan.

7- Li ber hin peyvan [?] heye. Ev pirsnîşan dide nîşandan ku di wateya wê peyvê de nezelalî heye.

Bi hêviya ku ev berhem di qada zimannasî û leksiyografyaya Kurdî de ciyekî bigire û bala baldarên vê qadê bide ser raboriya vê erdnîgariyê... (06.06.2011/Amed)

Azad ZAL  
(Nivîskar û Lêkolîner)

[\*] Kêlik: Di vê berhemê de di wateya "depp" û pêmayînên dîrokî yê nivîskî de hatiye bikaranîn. Me vê peyvê bi kar anî; ji ber ku ev peyv bi xweseriya xwe peyveke Aryanî û Kurdî ye. Ev peyv gelek kevnar e û hê jî di nava Kurdan de tê bikaranîn. Bîngeha vê peyvê jî "gil" û "kil" a Mezopotamyayî tê û niha li goristanan ji bo kevirê serê gorê yê ku li ser nivîs ji bo mirî tê nivîsin tê bikaranîn. Dewsa peyvên wekî "depp" û "deq" digire. Lê me di vê berhemê de bi tenê di dewsa "depp"ê de bi kar anî. (A. Z.)

"Û li tevahiya cihanê yek ziman, yek axaftin hebû."

Tewrad, Tekwîn 11:1-2

erat autem terra labi  
unius et sermonum  
eorum den

# SPASÎ

Ji bo alîkarî û piştgiriya wan a bêhempa; ji dayîka min Emîna; apê min Mehmet; xwarzî û biraziyên min Refik û Îsmail û Emer û mamosteyê min Umîd re zor spas...

Suleyman YILDIRIM

## PÊŞKÊŞÎ

Ez vê xebatê diyarî bîranîna dayîka xwe Nûcuda; ya ku her şev mêvanê xewnên min ên hêrî şîrîn e dikim.

Û diyarî cana/jana xwe...

Mamê ELÎ





## DESTPÊK

**Z**iman bi peyvê, bi gotinê heye. Ango peyv aliyekî ziman e. Ziman navgîna têkiliyên navbera mirovan e. Dema ziman tune bûye însanên berê ji bo daxwaz û hestên xwe ji hev re, ji yên der û dora xwe re biderbirînin bi destên xwe, bi jest û mîmikên xwe, xwestine xwe bidin fêmkirin. Wê çaxê xwederbirandin bi lebata bedenê û hêmanên bedenî bûye. Niha însan dipeyîve. Di civatekê de, di gotûbêjekê de dema mirov komî ser hev dibin êdî kes bi lebitandina dest û mîmik û jestan xwe naderbirîne. Her kes diaxive. Mirov bi zimanê xwe, anga bi navgîna axaftinê xwe diderbirînin.\*

## Ziman û Malbatên Zimanan

Ziman pergalek e. Ziman pergaleke xwezayî, zindî, giyanî, tevgerî û ramanî ye. Pergalbûyîna ziman û pergala ziman du têgînên ji hev cuda ne. Pergalbûyîna ziman; pergaleke ji pergalekî binesazî tê der û hemû pergalekî navma-kepergalê bi hev re guncaw in û bi hev re di têkilî û pêwendiyêke zindî û giyandêr de ne. Pergala ziman; pergaleke çêkirî ye û bi tenê ramanî ye. Ji ber vê yekê jî ziman nêzikahiyeke bipergal û berfireh dixwaze.\*

Di lêkolînên li ser zimên de, divê ku tu çaran ziman di derveyê rayek û raderên beriya xwe de neyê hizirkirin. Zimanê ku di destpêka perisîna mirovahiyê de bi hêman û tevgerên giyaneweran hatiye axaftin ji bo hemû zimanan wekî binyad tê dîtin. Bi demê re ji ber sedemên cihê cihê fi-

raqet û cudahî ketiye navbera zimanan. Lê her çi qas ziman ji hev cûda bûbin jî hevparî û xizmîtiya navbera xwe di xwe de parastine. Ji bo ku li ser hevparî yan jî cudahiye di navbera zimanan de lêkolîn bîn kirin, pêdivî bi zanîn û haydariya li ser tevahiya zimanên cîhanê heye. Lê ji ber ku li ser rûyê erdê gelek ziman hene, ev dibe asteng ku mirov di derbarê hemû zimanên dinyayê de bibe xwedî zanîn û agahiyên. Her wisa ev rastî der tê meydana, heta ku bi awayekî zanistî senifandina zimanan neyê kirin venêran û çavdêriya li ser zimanan jî ne pêkan e.

Zoologên ku li ser lawiran lêkolînan dikin bi rêbaza pergala zanistî ji binê kar û barekî bi vî rengî dertên. Di warên zanistî yên bi vî rengî de pîvanên berbiçav û mîsoger hene. Lê di qada ziman û zimanzaniyê de pîvanên ku zimanan ji hev veqetînin û wan bisenifînin bi mîsogerî ne teqez in. Ji ber vê yekê jî senifandina zimanan karekî pir zehmet e.

“Ku du mirov ji axaftinên hev û du fêm bikin wê demê zimanê wan yek e.” Lê teqezî di vê hevokê de tune ye.

“Gelo, di binyada xwe de, gundiyekekî û nûjdarekî (bijîşk) ku bi heman zimanî diaxivin dikarin ji hev fêm bikin?”

Di vê rewşê de pirsîyar zêdetir dibin û ev dibe paradoks û gengeşî.

Digel van zehmetiyan gelek zanyar û zimanzan li ser vî karî serê xwe eşandine û gihîştine hin encaman. Hin senifandinên ku ji aliyê piraniya zanyar û zimanzan ve hatine pejirandin jî hene. Di van senifandinan de xalên ku esas hatine girtin; pîvanên wekî; “têgihîştina ji hev” a di axaftina rojane de, di navbera du zimanan de “peyvên hevpar”, “xetên îsogloss” ango yên ku peyîvandina sînorên zimanan ên erdnigarî dikin û wekheviyên sazîkirinên hevokê ango “hevok-sazî” (sentaks) û yd.

### Malbata Hind-Ewropî û Zimanên Dinyayê

Di nîveka sedsala 19emîn de lêkonên destpêkê yên ku bi vî rengî hatine kirin derket holê ku di komek zimanên ku li ser wan xebat hatiye kirin de, hem ji hêla peyvsaziyê û

hem jî ji hêla sentaksê (hevoksazî) ve nemaze di serdemên kevnare de hevşibiyên mezin hatine peyitandin. Ji bo ku van zimanan di bin sîwanekê de bisenifinin; ji aliyê rojhilat ve Hindî, ji aliyê rojava ve Germanî wekî nav hat diyarkirin. Pêşî wekî nav Îndo-Germen hat bijartin. Lê bi demê re lêkolîn zêde bûn û hat fêmkirin ku ji bilî van zimanan çend zimanên din jî xwemaliyên vê malbatê di xwe de didin hewandin. Li ser vê yekê navê sîwanê wekî “Malbata Zimanan a Hind-Ewropî” hate guhertin. Di demeke nêzik de jî zimanên ku di roja me ya îroyîn de nayên bikaranîn –ango zimanên mirî, yên wekî Hitîtî, Lawikî, Frigî, Yewnaniya Kevnar, Pehlewî, Persiya Kevnar, Trakkî û hwd. jî di vê sîwana zimanan de hatin bicîkirin.

Ji ber ku ev ziman ji hêla dîrokî û civaknasiyê vê xwedî giringiyek mezin in ji hêla lêkolîneran ve bi baldarî lêkolîn li ser wan hatiye kirin û di encamê de jî hema hema tevahiya xwemaliyên van zimanan hatine peyitandin. Di navbera van zimanan de nemaze têkiliya vokabuler ango dengzaniyê eşkere ye. Wekî mînak; peyva “bav” di Almanî de “vater”; di Latîni de “pater”; di Yewnani de “pater”; di Persiya Kevnar de “athîr”; di Zimanên Gotî de “fatar”; di Sanskritî de “pîta” û di Toçerî de jî wekî “pâcar” tê gotin. Her wiha, peyva “heft” (Hêjmar) di Emanî de “sieben”; di Latîni de “septem”; di Yewnani de “hepta” di Persiya Kevnar de “seçt”; di Sanskritî de “sapta”; di Toçerî de “spât” û di Hitîtî de jî wekî “septa” tê gotin. Ji bilî peyvên nêzî hev qertafên kişandinê û şeweyên pêkanîna peyvan jî wekî hev e. Wekî mînak; kirdeya lêkerê gergûhêz qertafa (-s) û pêgera wê jî qertafa (-m) digire. Di lêkeran de, li gorî dema niha, civaka kesane ya yekjimar û sêyem, qertafa kesane (-î) , qertafa dema borî ya heman cînavê (-t) , qertafa pirjimariya heman cînavê (-ntî) û (-nt) ye. Di pêkanîna peyvê de gûherînên deng yên van zimanan bi van mînanan dê baştir bê ravekirin.

Elmanî	“bînde” (girê bide)	“bend”; (girêk)
Latinî	“tego” (binixumîne)	“hoga” (xila)
Yewnani	“demo” (damezirîne)	“domus” (xanî)
Slawî	“vezo” (biajo)	“vozu” (siware-erebe)

Di derbarê derketina malbata Hind-Ewropî de di angaşt hene. Li gorî angašta yekemîn; ji sedemên dîrokî yên ji hev cûda ev ziman ji parçebûna yek zimanî hatine pê. Li gorî angašta duyemîn jî, komeke zimanan di bin heman şert û mercên çandî, erdnigarî û tekiliyên cîrantiyê de heman xwemalî bi pêş xistine.

Malbata zimanên Hind-Ewropî li ser rûyê erdê gelek belav e. Ji ber vê sedemê jî di navbera zimanên endamên malbata Hind-Ewropî de hin cudahî bi demê re rû dane. Vê malbata zimanan, ji beşên Rojavayî û Rojhilatî pêk tê. Ferqîniya di navbera her du beşan de bi hin xwemaliyan teqez e. Di beşa Rojhilatî de di dengê palatel “k” de guherînên dîrokî pêk hatine û veguhêzîne dengê “s”yê. Wekî nimûne; hêjmara “100” (sed) di Sanskrîtî de wekî “sata”; di Avestayî de “satem” hatiye gotin. Li hemberî vê yekê heman peyv di Toçerî de “kânt”; di Yewnanî de “hekaton”; di Latinî de jî wekî “kêntum” hatiye gotin. Ji ber ku ev cihêtiya navbera sînorên diyalektên zimanên Hind-Ewropî eşkere ye ji beşa Rojhilatî re “Zimanên Satem” û ji bêşa Rojavawî re jî “Zimanên Kentum” hatiye gotin.

Digel vê rastiya malbata zimanên Hind-Ewropî, senifandina zimanên dinyayê bi vî şêweyê ku li jêr hatiye dayîn pêkan û derbasdar e.

## I- MALBATA ZIMANÊN HIND-EWROPÎ

### A. Koma Zimanên Germeî an jî Teutonî

1-Îngilîzî, Frisî

2-Almanî, Nederlandî, Flamenî

3-Zimanên Skandinawî

a-Swêdî

b-Danîmarkî

c-Norveçî (Bokmalî + Nîroskî)

Pêdivî pê heye ku, zimanê Efrîkans ku jêdera Nederlandî ye, [Li Komara Afrîkaya Başûr tê bikaranîn] û zimanê Yiddişî [Ku bi alfabeya Îbranî tê nivîsandin û şêwezarekî Almanî ye] jî tevînî vê komê bêne kirin.

## B. Koma Zimanên Keltî

- 1- Biretonî
- 2- Îrlandî
- 3- Galî
- 4- Welşî

## C. Koma Zimanên Romani

- 1- Frensî
- 2- Spanyolî
- 3- Îtalyanî
- 4- Portekîzî
- 5- Rûmenî

## D. Koma Zimanên Slawî

- 1- Rusî
  - a- Zimanê Belarûsî
  - b- Zimanê Ukrani
- 2- Bulxarî
- 3- Lehî
- 4- Çekî, Slowakî
- 5- Sirbî, Kroartî

## E. Yewnaniya Nû

## F. Ermenkî

## G. Arnawudî

## H. Koma Zimanên Aryanî

- 1- Aryaniya Kevnar
- 2- Avestî
- 3- Pehlewî
- 4- Peştuyî
- 5- Kurdî
- 6- Belûcî
- 7- Farisî

## I. Koma Zimanên Hindî

- 1- Hindî
- 2- Urduyî
  - a- Bengalî
  - b- Oriyayî
  - c- Marathî
  - d- Gujeratî

- e- Sidhî
- f- Penjabî
- g- Keşmîrî
- h- Nepalî
- 3- Beşa Zimanên Kevnare yên Hindî
  - a- Sanskritî
  - b- Prakrîtsî
- J. Koma Zimanên Baltikî
  - 1- Zimanê Lîtwanî
  - 2- Zimanê Letonyî

## II- MALBATA ZIMANÊN FÎNO-UGRÎKÎ

- A. Fînî
- B. Macarî
- C. Zimanê Estonî
- D. Laponî

## III- MALBATA ZIMANÊN ALTAYÎ

- A. Koma Zimanên Tirkî
  - 1- Tirkî
  - 2- Azerî
  - 3- Kirgizî
  - 4- Ozbekî
  - 5- Tirkmenî
  - 6- Kazakî
- B. Koma Zimanên Moxolî
- C. Koma Zimanên Mancukî û Tunguskî

## IV- KOMA ZIMANÊN QEFQASÎ

- A. Koma Zimanên Başurî yên Qefqasî
  - 1- Gurcî
  - 2- Mingrelî
- B. Koma Zimanên Bakurî yên Qefqasî
  - 1- Akbaşkî
  - 2- Awerkî
  - 3- Çeçenkî
  - 4- Kaberdkî

## V- ZIMANÊ BASKÎ

Vî zimanê ku li quntarên çiyayên Pîreneyê -ku di navbera Spanya û Fransayê de ne, ji hêla komeke mirovan ve tê axaftin. Bi tu awayî xizmîtiya wî û malbatên zimanan yên cihana kevnar nehatiye peyîtandin. Ji ber vê sedemê ye ku ev ziman bi tena serê xwe wekî malbateke tê pejirandin.

## VI- MALBATA ZIMANÊN SAMÎ

## A. Koma Zimanên Samî yên Rojavayî

## 1- Bêşa Zimanên Samî ya Bakurê Rojavayî

a- Ugerîtî

b- Îbranî

c- Fenîkeyî

Punîkî

d- Aramî

Sîrîdkî

e- Amorotî

## 2- Koma Zimanên Samî yên Başûrê Rojavayî

a- Erebiya Bakurî

b- Erebiya Başûrî

c- Hebeşî an jî Ge'ezî

i- Zimanê Tigreyî

ii- Zimanê Tigrinayî

iii- Zimanê Amberî

## B. Koma Zimanên Samî yên Rohilatî

## 1- Akadî (Asurî + Babilî)

## VII. MALBATA ZIMANÊN HAMÎ

## A. Koma Zimanên Berberî

1- Zimanê Kabîle

2- Zimanê Şîlî

3- Zimanê Zanga

4- Zimanê Tuareg

## B. Koma Zimanên Kuşîtî

1- Zimanê Somalî

2- Zimanê Gala

3- Zimanê Beja



## C. Koma Zimanên Çadî

1- Hausa

## D. Misriya Kevnar

1- Zimanê Kiptî

Malbata zimanên Samî û Hamî ji hêla çend zimanzanan ve di bin serenavê Hamî-Samî yan jî Afro-Asyayî tên senifandin û nîqaşkirin. Li Afrîkayê sê malbatên mezin ên zimanan hene û zimanên (?) endamên van malbatan xweserî komên mirovan yê biçûk û dorpêçkirî mane. Nîqaşên di berê zimanbûn an jî zaravbûna wan de hîn didomin. Ji ber vê sedemê ye ku me di senifandina li jêr de navên van zimanan (?) nedan.

## VIII- MALBATA ZIMANÊN ÇORÎ-NÎLÎ

A. Koma Zimanên Nîlî

B. Koma Zimanên Sudan navendî

## IX. MALBATA ZIMANÊN SAHARA NAVENDÎ

## X. MALBATA ZIMANÊN NÎJER-KONGOYÎ

A. Koma Zimanên Atlantîka Rojavayî

B. Koma Zimanên Mende

C. Koma Zimanên Gur

D. Koma Zimanên Kwa

E. Koma Zimanên Navendî

F. Koma Zimanên Bantu

## XI- MALBATA ZIMANÊN JAPONÎ

1- Japonî

2- Zimanê Ryukyu

## XII- MALBATA ZIMANÊN SÎNO-TÎBETÎ

A. Koma zimanên Tîbeto-Burma

B. Koma Zimanên Çînî

## XIII- MALBATA ZIMANÊN KADAYÎ

A. Zimanê Siyamî

## XIV- MALBATA ZIMANÊN MALAYO-POLÎNESÎ

- A. Koma Zimanên Endonezî
- B. Koma Zimanên Rojhilatî

## XV- MALBATA ZIMANÊN DRAWÎDÎ

## XVI- MALBATA ZIMANÊN AWUSTRALYAYÎ

## XVII- MALBATA ZIMANÊN AWUSTRO-ASYAYÎ

- A. Zimanên Wiyetnamî

Di derbarê zimanên cîhana nû de agahiyên destpêkê di dema ku Ewropî hatine heremê hatine bi destxistin. Ji ber vê sedemê ye ku di navbera dane û çavdêriyên ku qadên belavbûna van zimanan û hejmara komikên ku bi van zimanan axivîne yê wê demê û encamên lêkolînên niha de cudahiyên mezin hene.

Sedema vê jî ev e ku komegelên ku ji Ewropayê hatibûn niştecihên komegelên niştecih vegûhezibûn. Sedemeke din ev e ku; komegelên niştecih hem ji hêla hêza çekdarî ya Ewropîyan û hem jî hêza çandî ve zimanên Ewropîyan pejirandine. An jî hatina pîşavtin.

## ZIMANÊN CÎHANA NÛ

### I- Zimanên niştecih yê Amerîkaya Başûr

- a- Guarankî
- b- Aymankî
- c- Tupî-Guarankî
- d- Queçuakî

### II- Zimanên Niştecih yê Emerîqaya Navengî

- a- Quîçî
- b- Cacxiuelî
- c- Manî
- d- Yuketekî
- e- Kekçikî
- f- Otomîkî
- g- Zapotekî
- h- Mîkstekî
- i- Tatonekî
- j- Navahokî

## III- Zimanên Niştecih yên Emerîqaya Bakur

- A- Malbata Eskîmo-Aleutî
- B- Malbata Athabaskanî
- C- Malbata Algonquîanî
- D- Malbata Mosanî
- E- Malbata Iroquoyanî
- F- Malbata Natçez-Muskogenî
- G- Malbata Siouyanî
- H- Malbata Penûtiyanî
- I- Malbata Hokenî
- J- Malbata Aztekî
- K- Malbata Mayayî

\* \* \*

Pêşî peyv hebû, paşê nivîs derket. Ziman bi mirovbûna mirovan re hatiye holê; nivîs jî di demeke pêşveçûna mirovahiyê de li ser bingeha têkiliyên berfireh û bazirganiya navbera civakan hatiye holê. Nivîs; bi şikl û qayîdeyan nîşandana peyvê ye.\*

Dema ku mirovahiyê dest bi lêbarkirina çandê an go bi gotineke din serpêhatî û tecrûbeyên xwe ji dahatûya xwe re vegot, xwest ku deng bi awayekî dîtbar tomar bike. Di destpêkê de mirovahiyê li ser dîwarên şikeftên ku ji xwe re kiribûn nişteci wêneyên ajalan û der û dorê xêzkerin. Bi van xêzan xwestin ku dahatûya xwe bi serpêhatiyên xwe agahdar bikin. Bi domana demê û bi piralîbûna zanist û çandê re, êdî wêne ji bo vegotinê têrkar nehatin, ji ber vê sedemê wêneyên ku hest, raman û daxwazên mirovahiyê dîtbar dikirin perîsin û veguherîn xêzan. Di tabloya li jêr de perisîna dîtbariya deng a ku bi demê re veguheriye hatiye dayîn.

{Tablo; Peresîna nivîsa wêneyî û mîxî}

Civaka ku pêşî nivîsê bi kar aniyê civaka Someran e. Ji ber wê jî ji aliyê zimanzan û etnolog û dîroknasan ve Somerî wekî mijara sereke her tim tê nîqaşkerin. Wekî civak, gel li ser rûyê erdê Somerî nemane di derbarê wan de jî gelek nîqaş û guftûgo hene.

Herî zêde jî di derbarê zimanê Somerîyan de guftûgo têtê kirin. Bermayiyên Somerîyan yê herî girîng deq û nivîserên dîrokî ne. Ji van bermayîyan di derbarê Somerîyan de hin zanîn û agahî têtê stendin. Li gorî nivîser û deqên ku hatine xwendin û deşîfrekirin hin zanîn û agahiyên balkêş di derbarê zimanê Somerî de têtê dayîn.

Wate	kû Xwarin	şah Beraz	muşen Bafinde-Çivîk	gi Levne	şag Ser	kin Bexçe
B.Z 3000						
B.Z 2400						
B.Z 650						
Wate	gin/gub Meş	anse Ker	gu Ca	dug Qemef	su Dest	gisimmar Darqesp
B.Z 3000						
B.Z 2400						
B.Z 650						
Wate	şe Ceh	ud Roj	áb Cêlek	pû Pak-Çê	a Av	ku Masî
B.Z 3000						
B.Z 2400						
B.Z 650						

{Tablo; Peresîna nivîsa wêneyî û mîxî}

## NIVÎSA MÎXÎ

Pêşveçûna dirûvê nivîsa mîxî; di destpêkê de wekî nivîsa Çînî bi nîşaneyên berê wan li rastê û ji jor ber bi jêr ve hatiye nivîsîn. Tiştê ku vê nêrîna me piştrast dike jî ev e ku; di serdema pîktografîk de nîşane ku bi kopîkirina hêmanên xwezayê hatine bi destxistin. Jixwe hêmanên xwezayê di vê xuyangê de ne. Nîşaneyên ku ji xwezayê hatine girtin çêdibiyek pir mezin e ku bi siruştaxwe hatine nivîsîn. Ev yek tê wateya; nivîsandina deqan a ji çepê ber bi rastê ve û nivîsîna ji jorê ber bi jêrê ve ya nîşaneyên beşan. Pişt re bi sedemeke ku em nizanin nivîsên ji jorê ber bi jêrê ve  $90^\circ$  cî guhertin. Bi vê şeweyê hatin nivîsîn û hatin xwendin. Bi wî hawî nivîsa ku ji rastê dest pê dikir û ji jorê ber bi jêrê ve dihate nivîsîn, ji çepê ber bi rastê ve hate nivîsîn. Belkî jî ew wekî sererêzan hatin nivîsîn. Serdema vê guherînê bi awayek teqez hîn ne hatiye çespendin.

Piştî demekê bi sedemeke ku em nizanin -çêdibiyeye mezin e ku perawiyên pêşî yê xwezayî (wekî; herî, pelên daran) zû tehrîp dibûn; cîguheranek di navbera perawiyên xwezayî û gilê de pêk hat. Ango gil bû perawiya sereke. Piştî têgihiştina ku ji bilî xêzkirina wêneyan a li ser gilê, bi hêmaneke nivîsê (mîx, kelem û hwd.) bi pestîne nivîs hêsantir e. Qamîşê ku serê wî sêalî ye (stytus) hate bikaranîn.

Ji sedema zû şelanibûna gilê ji berdêla xêzên gilori xêzên rast hatin bikaranîn. Her çendî, di destpêkê de nûseran hewl dabine parastina formatên kevnaerê wêneyî jî ji sedema giriftiya nîşaneyan û zehmetbûna nivîsê dev ji vê yekê berdane. Di encamê de; bi pestîna pênûsê a li ser gilê û bi paş de kişana wê, nîşaneyeyeke di teşeyê mîxê de derket holê. Bi domana demê re jî nîşaneyên berê wan li çepê ji sedemên ku ne pratîk bûn ji holê rabûn. Bi wî hawî bi tevîniya çengala koşeyî ya bi nîşaneyên berwarî, serwarî û xwîl de nivîsa mîxî hate kemilandin.

Di serdemên destpêkê de hejmara van nîşaneyan nêzî hezarî bû. Bi domana demê re ev hejmar dakete şeşsedî. Nivîsa mîxî di 2700ên Berî Zayînê de hem ji hêla teşeyî ve û hem jî ji hêla naverokê ve xwe temam kir. Piştî vê xwete-

kûzkirinê, bi bikaranîna nişaneyên wekî kîte, determînatîf û îdeograman bû pergaleke nivîsê.

Gelên ku nivîsa mîxî bikaranîne ev in: Somerî, Akadî, Eblayî, Hûrî, Ûrartuyî, Elamî, Agarîtî û Persî (ku ew Persiya Kevnar e).

## DAHÛRÎNA NIVÎSA MÎXÎ


Nûvedana nivîsa mîxî ji hêla Someriyên ve pêk hatiye û Akadiyan bi pêş xistiye. Em dikarin wisa bihizirin; 'Wê demê bi pêmayînên Somerî an jî Akadî pêvajoya dahûrînê da destpêkirin'.

Di salên di navbera 1414 û 1626ên Piştî Zayînê de gerokekî Îtalî yê bi navê Pietro Della Valles, ji bajarê Îtalyayê yê bi navê Napoliyê dest bi gera xwe kir. Gera xwe li Kurdistanê, Anatolayayê, Suriyeyê, Îran û Misirê domand û li Romyayê bi dawî kir. Di nameyên ku Vellas di dema gera xwe de ji hevalên xwe re bi rê kirine de agahiyên di derbarê kavi û nivîsarên ku lêkolîn li ser wan kirine hebûn. Vellas çend nivîsên mîxî kopî kiribûn û ji hevalên xwe re şandibûn. Bi vî hawî cîhana rojavayî cara yekem bû ku ji wê nivîsa ku hatibû jibîrkin haydar bû. Ev di heman demê de destpêka mêjûyeke dirêj a lêkolînan bû.

Piştî Vellas gelek lêkolîner û zanyarên rojavayî, gelek nivîsarên Rojhilata Nêzik kopî kirin û ji bo dahûrîna wan tevgeriyan. Piştî Vellas bi 170 salî li Almanyayê mamosteyekî dibistana amadehiyê di vî warî de serkeftinek mezin bi dest xist. Ev kes George Friedrich Grotefend bû. Lê Grotefend berî dest bi xebatê bike xebatên gelek zanyaran wekî çavkanî pejirand û li ser wan xebat meşand. Ji van zanyaran navên din Oluf Tychsen û Friedrich Munter bûn ku wateya nişaneya xwîlê ya ku di nivîsaran de tim derbas dibû eşkera kiribûn. Wê nişaneya xwîlê peyv ji hev cûda dikirin. Tiştêkî din a ku bala Munter kişandibû, ew jî 'rêzenişaneyên ku ji heft nişaneyan pêk dihat' bû. Her çî qas di destpêkê de ev rêzenîşane wekî serenavekî şîrove kiribe jî Munter ji nivîsarên Pehlewî sûd wergirt û têgihişt ku ev peyv tê wateya

“key”an. Peyva din a pêşiya vê rêzenîşaneyê jî sernavek bû. Bi wê veditîne pêvajoya dahûrîna nivîsa mîxî dest pê kir.


Bûyer û qewimînên vê pêvajoyê bi tena serê xwe mijara pirtûkekê ne. Lê ji bo kû xwendevanê vê xebatê jî mijarê hatdar be ev nîşe hatine nivîsîn.



### ZIMANÊ SOMERÎ

Zimanê Somerî yekem zimanê ku bi nivîsa mîxî hatiye nivîsîn e. Xizmîtiya zimanê Somerî bi kîjan zimanî re heye hîn bi awayekî teqez nehatiye çespandin. Herema ku zimanê Somerî lê hatiye axaftin; başûrê Mezopotamyayê ye û ev der wekî Somer hatiye binavkirin.

Pîştî desthilatdariya Keyanê Akadî yê bi navê Sargon, herem ketiye bin desthilatdariya Akadiyan. Ji ber vê sedemê ye ku ev serdem di rêzebûyera Mezopotamyayê de wekî serdema Akadî tê nasîn. (B.Z. 2350-2150) her çendî pîştî serdema Akadiyan herem careke din dikeve ' in desthilatdariyan Somerîyan jî (Serdema Somerî ya nû; B.Z. 2150-2000) tê pejirandin ku li Mezopotamyayê serdemeke dirêj bi awayekî bîlingual (duzimanî) hatiye jiyîn. Lê tê pejirandin ku di nîveka hezarsala duyemîn a Berî Zayînê de ango beriya samîbûyîna heremê zimanê Somerî li heremê nehatiye axaftin.



Zimanê Somerî zimanekî agglutinatif e. Peyva “Agglutinatif” peyveke Latîni ye û ji rayeka lêkera “agglutîno” tê. Ev lêker tê wateya “qertafkirinê”. Di Somerî de her peyv xwedyê avaniyeke neguher e. Ev avahî bi pêşgîn û paşgînan dibe xwedyê wateyeke nû. Wekî mînak; wateya peyva DU avakirin e. Dema ku ev peyv pêşgîna “Î” bigire wê demê peyv dibe Î-DU û bi wateya; “Wî ava kir.” Bi heman têgihiştinê dema ku em bibêjin “NU.MU.DU” wê demê peyva me tê wateya “wî/ê ava nekir.”

Pergala nivîsandina Somerî ji kîte, bêje û îdograman pêk tê. Bêyî ku di navbera wan de nîşaneyên xalbendiyê bêne danîn; nîşaneyên mîxî ji aliyê çepê ber bi aliyê rastê ve li dû hev tene rêz kirin. Li jêr kîteyên mîxî û tîpgûhêziya wan a latîni hatine dayîn. Her çendî fonetîkeke tîpguhêziya Somerî ya xwemalî hebe jî me li gorî alfabeya Kurdî tîpgûhêzî pêk anî. Ji bo xwendevanên Kurdî ev guncawtir e.





## ÎDEOGRAM

Ji bilî kîte û bêjeyan di pergala nivîsa Somerî de îdeogram xwedî ciyekî teybet in. Îdeogram ew cure nîşane ne ku bi tena serê xwe watebêjiya têgehekê dikin. Nûser ango kاتبê Somerî ji bo ku nîşaneyên tevlihev bi kar neyînin bi glemperî îdeogram bikaranîne. Li jêr çend îdeogramên -ku zêdetir hatine bikaranîn, hatine dayîn. Peyvên determînatîf di heman demê de îdeogram in jî. Îdeogramên ku di nivîsa mîxî de têne bikaranîn bi piranî ji Somerî hatine wergirtin.

Dema ku nûserê Hititî dixwest peyva bi wateya yezdan ŞU.Î yê binivîse, ji ber zehmetiya xêzkirina nîşaneyan, ji berdêla nîşaneyê ŞU+Î yê binivîsê îdeograma Somerî "DINGIR" li deqê xêz dikir. Dema ku ev nîşane jî bilêv dikir ne wekî "DINGIR"ê, wekî "ŞU.Î" yî bilêv dikir.

## DETERMÎNATÎF

Determînatîf nîşaneyên diyarker in. Di nivîsa mîxî de di nava rêzê de têne bikaranîn. Lê dema ku tîpguhêziya nivîsa mîxî hate kirin; li pêşî an jî li dawiyê, li jora peyva ku pê re têkildar e têne nivîsîn. Ev nîşane pirjimariya peyvê diyar dikin. Her wekî din, zayenda wê, giyanewerî an negiyanewerîya wê, xambûjena wê, alavbûna wê çî cure têgeha erdnigariyîya wê (çiya, çem, bajar, welat) diyar dike.

Mînak; Peyva URU tê wateya bajar. Dema ku ev peyv wekî determînatîf tê bikaranîn;

### URU LAGAŞ

Ev peyv wekî "BAJARÊ LAGAŞÊ" nayê xwendin. Peyva "URU" ya ku wekî determînatîf hatiye bikaranîn, nîşan dide ku LAGAŞ bajareke.

### KUR ASSUR

Wekî "WELATÊ ASSURÊ" nayê xwendin. Bi tenê nîşan dide ku ASSUR welatekî ye.

### KUR AMURRU, KUR MÎZRÎ û hwd.









Peyva ku tê wateya çiya “HUR-SAG” dema ku wekî de-  
termînatîf tê bikaranîn;

HUR-SAGŞARAMMA

Ev peyv wekî “ÇIYAYÊ ŞARAMMAYÊ” nayê xwendin bi  
tenê diyar dike ku ŞARAMMA çiyayekî ye.

NÎNDAŞARAMMA

“ŞARAMMA” li vê derê wekî cureyekî nan hatiye bika-  
ranîn.

	= d	<b>Determînatîfa Yezdan</b>
	=I	<b>Determînatîfa Zilam</b>
	=LÛ	<b>Determînatîfa Mêr</b>
	=SAL	<b>Determînatîfa Jin</b>
	=URU	<b>Determînatîfa Bajar</b>
	=KUR	<b>Determînatîfa Welat</b>
	=GIŞ	<b>Determînatîfa Depîn ango Darîn</b>
	=ÎD	<b>Determînatîfa Çem</b>

{Çend determînatîfên sereke}

## PAŞDETERMÎNATÎF

Determînatîfên ku li dawiya peyva ku pê re têkildar in  
têne nivîsandin pir kêm in. Bi piranî wateya pirjimariyê li  
peyvê bar dikin.

Wekî nimûne;

DINGIR Yezdan

DINGIR<sup>MEŞ</sup> Yezdan(an)

Ji bilî determînatîfa MEŞ determînatîfa Hl.A yê jî wateya pirjimariyê dide peyvê.

Wekî nimûne;

URU<sup>Hl.A</sup> Bajar(an)

	=MEŞ	<b>Determinatîfa Pirjimariyê</b>
	=Hl.A	<b>Determinatîfa ji bo negiyaneweran pirjimariyê</b>
	=KI	<b>Determinatîfa welat</b>
	=MUŞEN	<b>Determinatîfa Balindeyan ( Çivikan)</b>

{Çend paşdetermînatîfên sereke}

## PERGALA HÊJMAREN SOMERÎ

Bîrkariya Mezopotamyayê gelek pêş ketibû. Asta bîrkariya Mezopotamyayê ji ya Misirê gelek pêşketîtir bû.

Di deqên ji 2 hezar salên Berî Zayinê de şopên hin hesabên hatine peyîtandin. Misriyan ji bo her hêjmareke mezin nîşaneyek bi kar dianîn. Someriyan bi qatên hêjmarekê digihiştin hêjmara ku tê xwestin. Wekî ji bo 360î; pergala 6 carî 60 bi kar anîne.

{Pergal û nîşaneyên hejmarên Somerî}








1/2 (BAR)=	1=	2=	3=	4=	5=	6=	7=
8=	9=	10=	11=	12=	20=	30=	40=
50=	60 (ŞU, ŞI)=	70=	80=	90=			
100 (ME)=	1000 (LÍ-ÍM)=				10000 (SIG)=		

Di roja me ya îroyîn de 60 xulek bûyîna saetekê , 60 çirk bûyîna xulekekê pêmayînek wê pergale ye.

Ji bilî wan, çemberek ji 360 parînekan pêk tê.

Parvekerên hêjmara 60î ji yên hêjmara 10ê pirtir in. Çêdibî heye ku ji vê sedemê ji berdêla pergala 10înî, pergala 60înî bi kar anîne.

Çend hevok û peyvên nimûne yên bi nivîsa mîxî û yên bi Zimanê Somerî hatine nivîsîn:

 
<p><b>Asurnasirpal</b> Assur-nasir-apli- AS-PAP-A, as-sur-PAP-A</p>

<p><b>Salmanasar</b> Sulmanu-asared- Sulmanu-MAS</p>

<p><b>Sargón II</b> Sarru-kin- Sarru-GIN, LUGAL-GI.NA</p>

<p><b>Senaquerib</b> Sin-ahhe-eriba- sin-PAP.-MES-eri-ba, EN.-ZU-SES.-MES-SU</p>

<p><b>Esarhadón</b> Assur-ah-iddina- AS-PAP-AS, as-sur-PAP-AS</p>

<p><b>Asurbanipal</b> Assur-bani-apli- as-sur-DU-A, AN.SAR-DU-A</p>

---

SOMERÎ - KURDÎ  
FERHENG



A	Av.
A.A	Hêz.
A.A.MU	Bavê min.
A.A.TEŞ	Qudret, hêz.
A.AB.BA	Derya.
A.AG.GA	Ferman, talîmat, emir.
A.AŞ	Nîşane.
A.BAD	Sî, sih.
A.BAR	Risas (lajwerd).
A.GAR	Zewî, zevî, çolter.
A.SAL	Spîndar, spêdar.
A.ŞA	Zêwî.
A.TAH	Alîkar.
A.ZU <sup>GU</sup>	Ava goşt.
AB.BA	Nijad.
AB.BA <sup>HIA</sup>	Bav û bapîr(an).
AB.SÎN	Dewsa haletê cot, dewsa gîsin.
ABÎSÎMTÎ	Dayîka keyanê Urê, Şusîn.
ABU	Ji bo tenduristkirina cendekekî Enkiyê nexweş, yezdanê ku ji hêla Nînhursagê ve hatiye afirandin.
ABZU	Derya, ava bi kûrahiya bêbînî, mala yezdanê avê; Enkî
AD.KID	Hesîr.
ADAB	Bajarekî giring ê Someran ê ku di navbera Lagaş û Nîppûrê de ye.
AG	Yar, xoşdivî, serdil.
AGADE	Bajarê ku Sargonê Mezin ava kiriye û ji xwe re kiriye paytext. Ji bo demek kin li cîhana kevnar bûye bajarê herî dewlemend û bi hêz. Li gorî çavkaniyên Somerî di dema neviyê Sargonê bi navê Naramsîn de hatiye hilweşandin



	û kawilkirin. Piştî serdema xanedana Sargon welatê ku bi navê Somerê hatiye binavkirin bûye "Somer-Akad". Peyva Agadeyê bi şeweyek din gotina Akadê ye.
AGGA	Desthilatdarekî xanedana yekemîn a Kîşê ye. Di destanên Gilgamiş û Agga de serlehengekî giring e.
AÎM	Pêşgîneke ku hêjmaran diyar dike, yekber, duber, sêber.
AKADÎ	Nîştasihên Samî yên Mezopotamyayê. Peyva Akad ji navê heremê hatiye bidestxistin (Di Pirtûka Afirandinê de jî bi vî rengî derbas dibe) bi navê Asurî û Babilî du zaravayên sereke yên zimanê Akadî hene.
AL.DI.RÎ.GA <sup>MUŞEN</sup>	Hawêrde.
AL.GAZ	Cutin, eciqandin.
AL.LULA	Kêvjâl.
AL.URUDU	Kolingê ji paxirê, kolingê paxirî.
ALA	Amûreke Muzîkê
ALAM	Peyker, wêne.
ALGAR	Navê amûreke muzîkê, çêdibiyek mezin e ku cureyekî çengê ye.
ALIM	Bîzon (ajal).
ALLARÎ	Cureyekî stranan, stranên evînî.
AM.SI	Kiriyar.
AM.SI.ZUG.	Diranfil, diranê fil.
AMA.AMA	Dapîr.
AMA.APIN.LA	Gayê cot, golikê ku pê cot tê kirin.
AMA.DUA.GA.LA	Dayîka min a xoşewîst.
AMA.UŞUMGALANNA	Navek ji navê Dumuzî ye. Peyv bi peyv wateya wê, "dayika asîman a ejderî" carinan jê wekî Uşumgalanna jî tê bikaranîn.
AMAR.AB	Nehgon, nogin, cêleka ciwan.
AMAR.MAH	Conega, cureyekî conegayan.
AMAR.MUŞEN	Çêlika balindeyan, ferxik.

AMAŞ	Çît.
AMBAR	Çirav, neyistan.
AN	Asîman.
AN	Yezdanê asîman ê Someriyân e. Wateya peyvê "asîman" e. Bi Akadî jî "Anu" ye.
AN.BAR	Hesin.
AN.BAR.GE	Hesinê reş.
AN.GE	Tavgirî, heyvgirî.
AN.KÎ	Erd û asîman.
AN.ŞE	Ker (ajal).
AN.ŞUR	Barana asîman.
AN.TA	Li jor.
AN.TAH.ŞUM <sup>SAR</sup>	Rîwekekê.
AN.ZA.GAR	Stûne, qûle, kulek
ANŞAN	Bajaredewletekî Elamî yê ku li başurê rojavayê Îranê ye.
ANTASURRA	Li bakurê Lagaşê heremek e.
ANZU	Rastxwendina balîndeyê mîtolojîk ku bi navê Îmdigud di nivîsarên kevnare de hatiye tomarkirin.
ARALÎ	Navek ji navê diyarê miriyan.
ARATTA	Bajarekî li Îranê ye. Cihê wî hîn nehatiye peyîtandin. Bi kanzayê xwe yên lajwerd û keviran namûwer e. Di destpêka hezarsala sêyemîn a Berî Zayînê de çêdibî heye ku ji hêla Ûrukê ve hatibe dagirkirin.
ASAG	Cinekî bed ku ji hêla Yezdan Nînurta ve li herema Kurê hatiye kuştin.
ASURBANÎPAL	Keyanê Asuran. Di sed sala heftemîn a berî zayînê de desthilatdarî kiriye. Pirtûkxaneya wî di nîvekê sedsala 19 emîn a piştî zayînê de hatiye dîtin. Pîraniya deqên pirtûkxaneya wî niha li British Museumê tên pêşandan.
AŞNAN	Xwedawenda dextlê. Xwişka Lahar.
AZÎMUA	Ji bo çengê Enkiyê ku diêşê tendurist

DUG/URUDU	AB.A	bike, yezdanê ku ji hêla Xwedawend
DUG	A.DA.GUR	Nînhursag ve hatiye afirandin.
GI	A.DA.GUR	Teşta avê.
GIŞ	AB	Firaqa dêrîndêza olî.
GU	AB	Qirşê kayê, qamîşa meyê.
GU	AB.NÎGA	Pace
GU	AM	Çêlek.
GUŞ/URUDU	AL	Çêleka xwedîkirî.
GUT	AMAR	Gayekî kovî, gakovî.
ITU	AB.E.A	Koling
KUŞ	A.GA.LA	Golik, golikê ber şîr, ajalên ciwan
		Meha dehemin.
		Çewalê ku ji post hatibe çêkirin, heban,
		meşk.
LU	A.ÎL.LA	Barkerê avê, hemalê avê (zilam, mêr).
LU	A.ZU	Nûjdar, bijîşk (zilam, mêr).
LU	A.ZU.SAG	Sernûjdar, serbijîşk (mêr).
LU	A.ZU.TUR	Bijîşkê biçûk (mêr).
LU	AD.KID	Qamîşger, hesîrker (mêr).
LU	AGRIG	Birêvebir, rêveber.
LU	ALAM.ZU	Qeşmer, qirdik, qerfok (mêr).
LU	AMA.LA.TU	Xulam, berdestê nav malê.
LU	AN.BAR.DÎM.DÎM	Hesinkar (mêr).
MUNUS	A.ZU	Nûjdar, bijîşk (jin).
MUNUS	AMA	Dayîk, mader.
MUNUS	AMA.DINGIR. <sup>LIM</sup>	Rahîbe, dayika yezdanan.
MUNUS	AMA.MUNUS	Dayîk, mader.
UDU	AM	Beran.

B

BA.BA.ZA	Mehita ceh.
BA.UŞ	Mirî, dimire.
BABBAR	Spî (reng).
BABÎL	Bajarê li bakurê Somerê. Wî bajarî di destpêka hezarsala duyemîn a Berî Zayînê de peytextî kiriye. Şahnişîniya Babîlan, navê welatê pêşî wekî Somer paşê jî wekî Somer-Akad e.
BAD	Dûrxistin, dûrketin.
BAD.ANT	Ya ku der û dora wê bi diwaran hatibê pêçan, bendkirî.
BAD.BAD.AN	Ger, dema ku bi...
BAD.KARAS	Baregeha leşkerî.
BADTÎBÎRA	Li başurê Somerê bajarekî ye. Ew cihê xanedanên efsanewî yên beriya serdema tofanê yên Somerê bû. Yezdanê wî bajarî yê parêzvan Dumûzî bû. Navê perestegha Dumûzî; Emuş an jî Emuşkallama bû.
BA'D	Sur, birc.
BAL (1)	Bi gorî kirin, gorî.
BAL (2)	Raperîn.
BAL (3)	Guhertin.
BAL.ZABAR	Teşîya tûncî.
BALBALE	Cureyekî stranên Somerî yên ku bi guftogoyên yezdanan ên dinavxweyî de têne ravekirin.
BAN	Yekaneya pîvana bi qasî litreyekê.
BAN	Yekaneke pîvanê.
BAPPIR	Nanê bîrayê, ji bo bîrayê beharek.
BE	Kanî.
BIAŞ	Ew.
BLUN	Ew î.

BIL	Şewitandin, şewat, sorkirin.
BIL.ZA.ZA	Beq (ajal).
BIR	Belavkirin.
BU	Ronî, rewnaq.
BUR	Mirad.
BURU (1)	Kulî.
BURU (2)	Havîn (demsala çinînê).
BUN	Bahoz, teriz.
DUGBUR.ZI	Tewqa goriyê.
GIŞBALAG.DIGAL	Amura muzîkê ya mezin.
GIŞBALAG <sup>DI</sup>	Amureke muzikê ku dişibê harpê an jî ribabê.
